XANIYÊ BÊ PÊRÎ

Çîroka: Ferîd Edgû wergerandina: Zeyneb yaş /Amed

Dibêm, min her û dayîm dixwest werim serlêdana we.

Dibê, nexwe, çima te pêk ne anî? Ez bêjim wextê min çênebû, lê na. Wextê min hebû. Wextê min hebû

Her tiştî bikim. Lê min karibû hinan bikim. hinan...

Bi keser digot, ma nexwe ez ji yên paşî me.

Dibêm, na ya rastî ew bû ku, ditirsiyam bêm bi ber te ve.

Dibê, çima? Ji ber te ne bi ya dilê xwe, bi gotina bijîjkê xwe kir?

Dibêm, vajî wê yekê. Bijîjkê min digot, here û bibîne wî.

Lê min, bawer bike ezê bi rastî bêjim, lê divê tu pê bawer bî, na, ditirsim ku tê bawer nekî.

Digo, ka bêje, bi dengeke qirçeqirç.

Ez tim tirsiyam ku wê sêhr xera bibe.

Dibê, te carekê sêhr xera kiribû ji xwe.

Dibêm, ne ew. Ne qala wê sêhrê dikim.

Dibê, li komirdankê, di rojekî ku tu li komirdanka min de dilîztî, ji ku hatibû hişê te, te destê xwe li valahiya li ser dêrî dipeland..

Dibêm, ez qala wê sêhrê nakim.

.... di derbekê de, te hêka ku qene nedihat bîra min jî, bê ka, kî danîbû wê derê dîtibû.

Bavê min, gotibû, hêka yomê ye.

Belê, lê cîranan, di pêşiya bavê te de dîtibûn û ji te re gotibûn, hema di wê gavê de bişkîne û bimîze ser.

Ez zehf tirsiyabûm. Lê çi gotibûn min, min jî kiribû.

Bi tinazî digot, êh çi be jî tu law bûyî!

Dibe, lê tişta ez qalê dikim ne sêhr bû.

Nexwe çi?

Binêre, ez ji te re bêjim, vebêjim, nizanim, tê fêm bikî?

Te go, sêhr, min fêm kir.

Lê ev, tişta tu qalê dikî ne sêhre.

Nexwe vebêje. Rave bike.

Sêhr mêhr tune li ortê. Ez... ez çawa bêjim nizanim, piştî ji te veqetiyam...

Di ser re sal derbas bûn. Ji min dûr jiyayî. Tu bûyî miroveke din. Lê jibîr neke ku tu di min de bûyî. Di min de mezin bûyî. Min qet te jibîr nekir.

Ji ber hêvîdar bûm ku wê te yê min bida jiyandinê. Tim lêviya te bûm.

Jê re dibêm, ax, wisa nepeyive!

Dibê, ezê çima rastiyê veşêrim.

Min_ te_ qet jibîr nekir.

Dibêm, lê ez, ma tu dibê qey min te jibîr kir?

Dibê, heke te jibîr nekiribûya, te yê serî dabûya min.

(Dengê dêriyê hatî girtin)

Dibêm, binêre, ez ê ji te re çawa bêjim... Belê, ji te veqetiyam. Dûrî te mam, Belê, bi salan jî ber bi hêla te ve nehatim.

Lê tu herûdayîm di xewn û xeyala min de bûyî.

Dibê, wekî vê şevê?

Dibêm, belê, wekî vê kêliyê. Dengê deriyê vebûyî. Hênikahiya eywanê. Mitbex. Bil-qebilqa beroşê. Eywana jor. şaneşîn. Gûlûsxane. Odeya rûniştinê. Sedir. Balgivên ji giya. Odeya biçûk ya li kêlekê.

Gava dapîra te mir dabûn te.

Na, tiştek nedan min. Ne hewce bû jî. Ez li te mezin bûm.

Berî kêliyekî wekî te jî gotî. Vê yekê jî têra min kir.

(Cama şikestî ya pencereyekê)

Dibê... paşê? Hêvîdarim te hê neqedandibe?

Na, min neqedand. Di rênceka bi trabzan ku berjorî eywanê dibû.

Çend pêpelûk bûn?

(Qirçeqirç)

Dibêm, hivdeh. Tam hivdeh pêpelûk. Ji xeynî berdirêncekê. Ji xeynî sihanê. Tev jî ji depên qetranê ne.

Dibê, belê, rihmetiyê bavê te dabû çêkirin.

Dibêm, gava dihatin şûştin bêhna miskê dihat.

Dibê. lê êdî bêjnê nade. Bêhna miskê jê nayê.

Dibêm çima?

Bersiv tune.

(Xirtêna deriyê li ber tuneyî)

Dibêm, gava tu derketî jorê, eywana mezin. Eywana bê ser û ber. Hespê bide lîstin.

Dibê, te dida lêstin. Hespê xwe yê textîn. Te tim li wê derê dida lîstin.

Dibê, bi rastî jî çi bû bi hespê min?

Dibê şewitandin. Yên piştî te hatî, rojeke ziviztanê, di zemheriyekê de tiştek nedîn ku bişewitînin, hespê te dîtin û sewitandin.

Dibêm, başe ku,Trabzan, çeperê şaneşînê ne şewitandin.

Dibê, ew jî şewitandin. Lê di zivistanên paşê de.

Kengê ku tu têtî xeyala min, dibêm, bexçê te tune.

Dibê, tune jî, ji ber wê yekê ye.

Dibêm,. çawa tune ye?

Dibê, dîwarên wê hilweşiyan. Tu kesî, piştî te tu kesî neselihand.

Cîranan perdeya textîn jêkirin, ew jî şewitandin. Dibêm, lê dar? Dara min a alûçê, lê ya tû yê? Lê ya ya xurmê? Dara alûçê, piştî sala tu çûyî berê xwe yê herî bi fêkî da, paşê jî hişk bû û çû. Dara tûyê hê terr bû birrîn. Ya xurmê, piştî birrîna dara tûyê dît, ber neda. Wê jî ji ber ku ber neda birrîn.

Dibêm, kê bûn ev?

Dibê, xerîb bûn. Li çiya bariyabûn lê bûn şape û dan ser warê me.

Dibêm, êêê... têkiliyeke te ya çawa bi wan re çêbû.

Gava dîtîn ez vala me, deriyê min şikênandin, ketin hundir û bicî bûn.

Ne, ez bê kes bûm, We hemûyan min hiştibû û hûn çû bûn. We hemûyan.

Çawa ku yê bi sal û dewranan sitar li we kiribe ne ez bim. Yê çû, çû û çû. tişta pê dişewitim ewe ku di jiyana we de bê cî bûm.

Dibêm ew çi gotine. Xaniyê xeyala min tenê tu yî. Bi demên dirêjtir jî di xaniyên dî de jiya, . Lê tenê xaniyê di xeyalên min de tu bûyî.

(Dûxana ji xêyiyê diçe û bêhna wê)

Nexwe çima tu li min venegeriyayî? Çima qene nebe rojekê te nehat û min nedî?

Te çima xerîb neajot in û min careke din neselihand. Çima te min neselihand û ranexist. Çima ji mehê carek ba jî tu nehatî û rûneniştî li odeya xwe ya ku tu lê bûyî û mezin bûyî? Çima wisa ji xwe re te xwe li ser sedran yekê ku bavê te xwe li ser dirêj dikir û xwe rihet dikir? Çima ji rojan rojekê te nehat dest neda, text, pencere û ji qefesên min yekê? Qene tu bê bizmarek be jî te lê da? Qene bê rojekê te hat mîzt daşra min a bi mar û mişk?

Dibêm, ax, pirsnan. Pirsnan nepirse. Rêz neke pirsan. Pirs hew qas gelek in ku...Tenê pirsin. Vêxistina mina menqerê û anîna wê ya hundir. Rojên ziviztanê. Di odeyekê de, rojên zivistanê ku bi mêvanan re li her diciviyan. Ya rastir şevên zivistanê.

Tu bêriyê dikî?

Bêrîkirin? Nefretê dikim!

Nefret, min pê zanibû. Lê gelo, sûçê min çibû?

Tu sûçê te tunebû. Te me hemûyan disitrand. Min li eywana te hespê xwe diajot. Hespê xwe yê textîn. Lê belê mişkên te. Ew mişkên te yên kerîh. Ew mişkên xof, pîs, kerîhên lexemê? Xildên te?

Dibê, bipeyive, dixwazim pê bizanibim bê ka mehdê te li çi nedibû, nefreta te. Bê qey tenê mişk bûn, tenê kore mişk bûn? An ne mahr bûn?

Ax, wan tevlî van neke,, ez ji wan qet netirsiyam, tu pê zanî.

Mahrên ku bavê te wan bi şîr xwedî dikir.. Yên ku te şilhê wan didîta, wekî tu bi mucîzeyekê re rû bi rû mabî te dayî destê xwe û lê nêrtî û ji bo sêhrê xera bike te dayî diya xwe silhê mahrên min.

Lê belê min tu carî dest neda hêkên mahrên te. Gava min ew didîtan jî. Min ji tu kesî re tiştek nedigot. Tu pê zanî.

Dibê, lê belê bîra min. Mehdê te li bîra min jî ranayê?

Dibêm na_ belê. Di wan rojên havînê de, te ya ku min av bi dolabê jê dikişand li bexçe xwe pê dişûşt. bi şerbika av dicemidand, zebeş davêtinê dibûna mîna qeşayê û min ew dişkandin, na lê paşê...

Dibê, ne min kir, ne min ew kişand bîrê.

Hilbet, ne te ew kişand. Lê tişta me hemûyan dilişand wir tilsimek bû.

Dibê, tu tilsim tunebû. Tu carî jî çênebû. Tenê ez hebûm û hew.

Dibêm, bêguman tu hebûyî. Tişteke hebûyî bûyî. Tu dîsa jî wisa yî. Ka binêre, va ez hatime. Min li dêryê te xist û bi te re dipeyivim.

Dibê, çi hişê te yê ecêb heye. Ev çi hişeke bobelete bi te re. Tu çi bê merhemetî!

Dibêm, ji te heyî ev hişe?

(Terqêna dêriyekî hatî girtin)

Dibê, hiş. Hişê kambax. Kêliyeke din tê miriyên di vî derî re dernîn jî bijimêrî. Nefreta te eve.?

Dibêm, na. Ne nefrete! Xenoqe.

Dibê, ji min?

Dibêm, na.

Dibê nexwe çima? Ji kîjan kesan?

Dibêm, ne ji kesên ku li te jiyane jî.

Dibê, çawa dibe. Ji xwe?

Ax, dîsa pirsnan! Wextê xalê min jî hatî bi tûrikê xwe yê pirsê hatibû: Di vê malê de goşt nayê xwarin? Di vê malê de şîr nayê vexwarin? Di vê malê de heroj rojname nayê xwendin? Di vê maly de li radyoyê nayê guhdar kirin? Di vê malê de nabêje û nareqise?

Ev pirsnên li doşeka mirinê bûn.

Û yên ku bersiva wan nîn bûn, mene wisa?

Dibêm, hêsrên min.

Dibê, tu di zarokatiya xwe de pir digiriyayî. Tê bîra min.

(Dengê cama ku dişkest)

Xwe spartî quncekî. An jî di bin lihêfê de. Bê ku sedemek jê re hebe.

Dibêm, herûdayîm sedemek jê re hebû.

Dibê, kî pê zane. Belkî.

Dîsa pirseke din. Dîsa wisa ye?

Tişta wisa ye çiye? Tişta dibe çiye?

Dibê, hêsr.

Di zarokatiya xwe de min hew qas barandin ku vêga çavkaniyên min zipîzûha ne.

Dibê, bawer nakim rast be.

(Dengê niqandina dilopên kaniyê)

Çavên te dîsa qenc dibîne?

Dibêm, belê.

Ma tu nabînî çawa perîşan bûme ji hev dikevim?

Dibêm, belê.

Dibê, pozê te, pozê te dîsa qenc bêhnê dike?

Dibêm, belê.

Bêhna vê ritûbetê, rizîbûniyê dikî?

Dibêm. belê.

Dibê şikûr. şikûr. Tu dixwazî derkevî û li bexçe binêrî?

Dibêm, di heye li bexçê?

Dibê, dar û barên te lê danî tev hişk bûne. Yên hişk hebûyî jî birrîn.

Te ev gotin. Wekî din?

Lexem tevlî ava bîrrê bû.

Wekî din?

Paşê jî zûha bû. Lê hê jî bêhneke pîs jê tê.

Dibêm, cesed tê de tunebin?

Dibê, ne yek, çendîn cesed. Belkî jî leş. Belkî him cesed, him jî leşnin.

Dibêm, te gelekî kişand. Dizanim, te gelekî kişand. Tu kes, tu tiştî nekaribû hew qas xwe li ber van tiştan bigirta.

Dibê, minê çawa karibûya ku xwe li ber vê talan û bê rûmetiyê û wê.. xerîban bigirta?

Dibê, işqa te ya ewilî tê bîra te? Te di min de jiya bû. Di odeya sebeta ya bişûk a li kêleka gûluszxanê.

Dibêm, na.

Dibê, bawer nakim ku te jibîr kiribe.

Dibêm, min jibîr kiriye.

Qet nayê xeyala te?

Dibêm, na.

Lê ew keçika biçûk, ku pêsîrên xwe berdestî te kirin, şalê xwe yê kin daxist..

Dibêm, qise neke.

Janê dide?

Na, tenê tê hişê min.

Dibê, bawer nakim te jibîr kiribe. Welî din, işqa te ya dawî ku te li min jiyayî?

Dibêm, na. Ew jî nayê hişê min.

Dibê, bê ez bi vê bawer im. dibe ku te ew jibîra kiribe. Dibe ku ew niqta hişê te tertî girtibe. Ev dibe. Xwedê zane bê ka paşê te çendîn kes nasandine.

Min tu kes nas nekir.

Tu kes?

Tu kes.

Nexwe tu li bavê xwe hatî.

Dibêm, di vî çileyê reş de qene pel jî neleqe, nakeve serê mirovan.

Dibê, ma pel nemane ku. Dibêjim, dar hişk bûn. An jî birrîn. Ne tenê yên li bexçe, Yên li derdorê tev.

Dibêm, yên li ba kaniyê jî?

Ew çinara kevnar jî?

Ew çinara kevar jî, ew dara kizwana ku te ji fêkiyê wê hez dikir ya sed û heftê û pênc sale jî. Hêmû.

Dibêm, lê qene ba jî nayê.

Dibê, daniye.

Tişta tenê danayne ev axaftina mine?

Bersivê nade.

(Tenê, ji kûrahî, dengê aveke ji kûrahî diherike.)

Dibêm êdî ez herim.

Ev bes û zêdeye ne wisa?

Ji bo vê gavê.

Tê dîsa werî?

Ne bawerim.

Bise, neçe. Daxwaziyeke mina dawî ji te heye. Ji kêzikên ku textên min dikojin pê ve tu zindî li min nemance. Wê di nêz de berf bibare. Seqem. Wê dîsa werin textên min jê rakin. Jixwe bi vî halî xwe bûme wekî qefesa fiqereyan. Qenciyekî dawî bi min bikî... qenciyek dawî.

Çi daxwaz dikî?

Dibê, min bişewitîne, (Nalîn). Îşev, berî ku tu herî, ar bi min vêxe. paşê jî bê ku tu li paş xwe binêrî bidê here. Ez xwe bi xwe germ bikim, bi alavên xwe.

Dibêm, ez nikarim vê yekê bikim.

Dibê, ka binêre şeveke bê ba ye. Qene pel jî na leqin. Te bi xwe got.

Agir navêje derdorê. Zerer nadim tu kesî. Jixwe li derdorê qene xaniyek textîn jî nemaye. Nemaye. Hemû şikêrên kevirane. Bê bîçim, şikêra betona sar. Bila bişewitim bibim xwelî. Êdî têk çûme. Vê yekê li min zêde nebîne.

Dibêm, nikarim vê yekê bikim.

Dibê, başe, cixareyekî vêxe. Du hilma bikşîne bavêje ser rûberê.

Derî li pey xwe bigre û here. Ez karê xwe bi destê xwe bibim serî.

Min hilmek dawî ji cixara xwe kişand. Di derbekê de sedinîm. Paşê avêt ser rûberê. Bi pozê sola xwe, wekî ku min her carê dikir, hêdîka, wekî ku mirov dubişkekî bpierçiwîne, perçiqand. Bê ku li pişt xwe vegerim ji malê derketim.. dema derketim min dêrî negirt. ji xwe dêrî ji tunebû.

Jêder

Ferid Edgû/ Yşte Deniz, Maria (Va Derya, Marîa), We.ş YeKy, Çapa 2, Şibat 2001, Stenbol.